KAR Û BAR

Evro dilên nazik çi dibêjin?

Sedîq Şero

Evro giriftariyên siyasî û aborî û vezivirîna dengvedana wan ya tehil li ser mirovê nazik, bûye egerekê serekî bo peydabûna nexweşiyên dilî û derûnî û reqbûna riha û hişkbûna xûnê. Evro fişara xûnê li jiyê 30 salî peyda dibe.

Rawestiyana dilê gencan peyda dibe, lawaziya xûnê û leşî di jiyê xortaniyê de xuya dibe sehkê û lê binêre dê bînî ew dilê zemanê westandî yê li bin çareseriyê, ev e zemanekê bi zehmet e van dilên nazik têk didin û dibe berîkana şaristaniyatiyê, xwe hebûna mal û malatî li demekî ku dilên babê van gencan berxwedanek di gel jiyanê hebû, li ser difna nexweşî û tengaviyê, tengezariyê û belengaziyê û derbideriyê, belê dilê pûlayî bû, evên henê derzîkên şikestinê û dakeftinê didanê, belê nedişiyan xewnên dilî jê bistînin... evroke dilî zêdetir xwe bergirî nema, giriftariyên leşî bi hemû cûnên tiknolojiyayê ve divêt û xewin û hêvî dimirin, ev dilên tenik û nazik xwe bigirin û zemenî gelek hozanvanên me hişik kirin zuha kirin û binbirkirin, hosa agehdariyek hate weşandin ji nivîsîna hozanê hişyar bin, hozannivîsîn penceşêrê bo xwînê çêdike, êşa dilî peyda dike, fişarê bilind dike, hişyar bin, hişyar bin.